Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 403 nameronahi@gmail.com 29 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# MATERYALÊN RÊVEBERIYA XWESER DERBASÎ DIBISTANAN DIBIN



Mûduriyeta Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Dêrikê ji bo mamosteyan dewreyên perwerdê vekirin. Wê mamoste bi riya van dewreyan perwerdê li ser meteryalên dibistana seretayî heyanî dibistana amadehî bibînin.

Li Herêma Cizîrê 21 hezar mamoste li ser meteryalên dibistana seretayî heyanî dibistana amadehî perwerdê dibînin. Ev perwerde ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê ve hatiye birêxistinkirin.

Mûduriyeta Perwerde û Fêrkirinê ya bajarê Dêrikê jî dest bi dewreyên perwerde yên mamosteyan kiriye û niha hezar û 93 mamoste li ser meteryalên perwerde yên nû perwerdê dibînin. Piştî ku dewreyên perwerdê bi dawî bibin wê mamoste li ser dibistanên herêma Dêrik, Koçeran û Beravê werin belav kirin.

## MATERYALÊN RÊVEBERIYA XWESER

Li herêma Cizîrê li hemû dibistanên seretayî heyanî dibistana amadeyî refa 11`emîn dê şagirt merteryalên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk yên nû bixwînin. Hemû pêkhate dê meteryalê nû bi zimanê xwe yê dayîkê bixwîne. Meteryalên refa 12`emîn a dibistanan amadehî hîna nehatine amade kirin.

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk dema ku dest bi xebatên amadekirina meteryalên nû kir ji dibistana seretayî dest pê kir, par jî meteryalên dibistana navîn hatin amadekirin û îsal jî meteryalên dibistana amadehî heyanî refa 11`emîn hatine amadekirin. Ji bo sala nû ya xwendinê meteryal heyanî refa 11`emîn hatine amadekirin û ji bo refa 12`emîn jî Rêveberiya Desteya Perwerde û Fêrkirinê Menal Mihemed da zanîn ku Desteya Perwerde û Fêrkirinê niha amadekarî dike ku Zanîngeha Rojava fireh bike, şaxên wê zêde bike û avahiyên nû lê bikin da ku şagirtên refa 12`emîn jî dest bi xwendina meteryalên nû yên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk bikin.

## XALÊN NÛ HATIN ZÊDEKIRIN

Di meteryalên nû de madeyên zanist û wêje hatine amadekirin, niha mamoste jî li ser madeyên meteryalên nû weke dîrok, erdnîgarî, bîrkarî, fîzîk û kîmya, zimanê Erebî, zimanê Kurdî û Îngilîzî, mûzîk, resim û werzîşê têne perwerde kirin.

Rêveberiya Xweser pirtûka netew û ol ji meteryalê nû rakiriye û şûna wê li ser meteryalên dibistana seretayî madeya `islûb û rêbazên perwerdekirinê` zêdekiriye û madeyên `çand û exlaq, zanista civakî, islûb û rêbazên perwerdekirinê, zimanê gerdûnê û jineolojî` li ser meteryalên dibistana navîn û amadehî hatine zêdekirin. Her wiha tê nîqaşkirin ku şûna madeya ol madeyekî bi navê `dîroka ol û baweriyên gelan` were zêdekirin.

## PÊKHATE WÊ BI ZIMANÊ XWE BIXWÎNIN

Li Bakurê Sûriyê û Rojava zimanê Suryanî, Kurdî û Erebî zimanên fermî ne ji ber vê yekê Rêveberiya Xweser meteryalê nû bi her sê zimanan amade kiriye.

Niha mamoste li ser meteryalên bi zimanê Kurdî û Erebî têne perwerde kirin û amadekarî tê kirin ku mamoste li ser meteryalên zimanê Suryanî jî werin perwer kirin. Ji bo meteryalên zimanê suryanî navendên taybet hene dê Desteya Perwerde û Fêrkirinê û Komeleya Çandî ya Suryanî van navendan organîze bikin.

## PERWERDEYÊN MAMOSTEYAN DU MEH IN

Li gorî bernameya Desteya Perwerde û Fêrkirinê wê mamoste demsala havînê du mehan perwerde li ser hevdû bibînin da ku bikaribin meteryalên nû bidin şagirtan. Her wiha Rêveberiya Xweser mamosteyên ku meteryalên rejîmê didan pêşwazî dike. Rêveberiya Xweser dê wan mamosteyan di ezmûnan re derbas bike û mamosteyên dikarin perwerde bidin qebûlbike.

## HEDEF AVAKIRINA KESAYETE

Li gorî sîstema xwendinê ya Rêveberiya Xweser di pêvajoya seretayî de asta şagirt çi qasî xerab be ew di refa xwe de namîne û dê refa xwe derbas bike. Rêveberiya Desteya Perwerde û Fêrkirinê Menal Mihemed Emîn anî ziman ku eger şagirt di dibistana seretayî de têkbiçe dibe sedema bandoreke neyînî li ser piskolojiya wî bike û wiha berdewam kir:˝ Di pêvajoya dibistana seretayî de em şagirtan ji hemû aliyan ve perwerde dikin û hedefa me avakirina kesayeta şagirtane˝.

ZEHMETÎ DERBAS BÛN

Menal Mihemed Emîn anî ziman ku ew niha 20 hezar mamoste li ser meteryalên nû amade dikin û got: ˝Me di pêvajoyên destpêke yên xwendinê gelekî zehmetî kişand lê belê me ew zehmetî derbas kirin˝.

Ji bo malbatên şagirtan jî Menal Mihemed Emîn wiha got: ˝Ji pêşeroja zarokên xwe netirsin, êdî tecrûbeyên me yên xwendinê ji yên rejîmê zêdetir bûne. Me di pêvajoya destpêke ya xwendinê de gelekî zehmetî kişandin lê belê em niha gihîştine pêvajoya vekirina zanîngehan˝.

## REXNE DIHATIN KIRIN

Opozisyonê di bin navê mamoste ne pisporin û meteryalên Rêveberiya Xweser nayên qebûlkirin, her tim Rêveberiya Xweser rexne dikir. Partiyên weke ENKS`ê û hinek aliyên girêdayî rejîma Sûriyê dixwestin li pêşiya meteryalên Rêveberiya Xweser bibin asteng.

Mamosteyê bîrkarî ê bi navê Mihemed Qedrî ku diploma li zanîngehê rejîma Sûriyê girtiye 12 salan mamostatî li gel rejîmê kiriye niha jî tevlî dewreyên perwerde yên mamosteyên Rêveberiya Xweser bûye. Mamoste Qedrî wiha got: ˝Meteryalên Rêveberiya Xweser gaveke baş e û eger di pêşerojê de danûstandin di navbera Rêveberiya Xweser û rejîma Sûriyê li ser destûrê were kirin, mirov dikare meteryalê xwendinê yê Rêveberiya Xweser têxe destûra Sûriya pêşerojê˝.

Mamoste Qedrî bang li hemû mamosteyên meteryalên rejîma Sûrî didin kir da ku tevlî dewreyên perwerdê yên Rêveberiya Xweser bibin û li ser meteryalên nû perwerdê bidin şagirtan.

Mamoste Qedrî li bajarê Qamişlo li ser madeya bîrkarî ya meteryalên Rêveberiya Xweser perwerde dît û niha li herêma Dêrikê komên mamosteyan li ser meteryalê Rêveberiya Xweser perwerde dike.

## DIVÊ EM ZÊDE XWE PERWERDE BIKIN

Têkildarî meteryalê xwendinê yê Rêveberiya Xweser mamoste Mihemed Qedrî got:˝ Meteryalê Rêveberiya Xweser ji yê rejîmê baştir e. Lê belê hîna pêdiviya me heye ku em hîn zêdetir li ser vî meteryalê nû xwe perwerde bikin. Tecrûbeya me ya meteryalan hîna nû ye û divê em hîn zêdetir di karê xwe de pispor bibin˝.

Cûdahiya di navbera meteryalên rejîma Sûriyê û meteryalên Rêveberiya Xweser mamoste Qedrî wiha şîrove kir: ˝Zanist di hemû zimanan de zaniste lê belê ez niha bi zimanê kurdî fêrî têgehên zanistî bûm û ev ji bo min tiştekî nû bû. Tişta baş em bi zimanê xwe fêrbibin û bidin fêrkirin. Berî niha em bi zimanê erebî fêrî têgehên zanistî bûn, niha em bi zimanê xwe zimanê kurdî fêrî têgehên zanistî dibin. Ez bi vê yekê gelekî kêfxweşim û perwerdeya me ya li ser meteryalên Rêveberiya Xweser gelekî baş derbas bû. Li dibistanên me rakirina meteryalên rejîma Sûrî û li ser meteryalên Rêveberiya Xweser xwendin berdewam kirin gavekî gelekî baş bû. Di şoreşê de bi zimanê kurdî fêrkirin erkekî exlaqî ye ku ji me têxwestin˝.







## DIVÊ PERWERDE DEWAM BIKE

Mamoste Ezîz El-Ezîz bi zimanê Erebî li ser meteryalên Rêveberiya Xweser perwerde dibîne. Ezîz got: ˝Di meteryalên rejîma Sûriyê de mirov fêrî her tiştî nabe, çarçoveya wê diyar e lê belê bi riya meteryalên Rêveberiya Xweser min kevneşopî û çanda gelên curbecur naskir. Ji ber vê yekê divê dewreyên perwerdê yên mamosteyan berdewam bikin. Em ê bi riya van dewreyên perwerdê yên mamosteyan bighîjin asteke hîn baştir.˝

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 403 29- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Emê destûrê nedin dagirkeriyê



Ji bajarê Kerkûk yê Başûrê Kurdistanê bi dehan ciwan beşdarî çalakiya mertalên zindî ya li Qendîlê bûn. Ciwanên Kerkûkê diyar kirin ku ji bo bibin mertalê zindî hatine Qendilê. Ciwanan bal kişand li ser êrîşên dagirkeriyê yên li çar parçeyên Kurdistanê didomin û ragihandin ku ji bo xwedî li Başûrê Kurdistanê derbikevin li Qendîlê ne. *R-5*

# TERORA ERDOGAN WÊ LI CÎHANÊ BELAV BIBE

Têkildarî dagirkeriya dewleta Tirk a li rojhilata navîn û vîzyona çareseriyê ya demokratîk a Kurdan li Parlementoya Ewrûpayê (PE) konferansek hate lidarxistin. Komîsyona Hemwelatiyan a Tirkiyê ya Yekîtiya Ewrûpayê, Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, Enstîtiya Kurdan a Brukselê, pêşengî ji konferansê re kirin.



### DAGIRKERÎ HAT ŞERMEZAR KIRIN

Li Parlamenta Ewropayê di konferansa der barê dagirkeriya dewleta Tirk de hate destnîşankirin ku dagirekeriya dewleta Tirk a li Efrînê “Der Qanûnî ye” û divê tavilê bê şert û merc ev dagirkerî bê qedandin. Di konferansê de encamnameya ji neh xalan hate qebûlkirin. Di encamnameyê de hate destnîşankirin ku ev dagirkerî li dijî pîvan û hedefên Neteweyên Yekbûyî ye, li hiqûqa navneteweyî nayê û dagirkeriya hêzên Tirk hate şermezarkirin.

### REWŞA GEL LI EFRÎNÊ ZEHMET E

Konferansa li Parlamenta Ewropayê, li ser dagirkeriya dewleta Tirk a li Efrînê û vîzyona Kurdan a ji bo çareseriya krîza li Rojhilata Navîn hat lidarxistin. Hevseroka Desteya Rêveber a Kantona Efrînê Hêvî Mistefa bi rêya skype tevlî rûniştina yekemîn bû. Mistefa qala rewşa Efrînê kir û nerazîbûn nîşanî bêdengiya cîhanê da. Hêvî îşaret bi şert û mercên giran ên jiyana li Şehbayê kir û diyar kir ku derfetên wan nîne ku zarokan bibin nexweşxaneyan.

### ÎRO LI EFRÎNÊ SIBÊ LI HER DERÊ

Hêvî Mistefa wiha got: “Şêniyên Efrînê ji bo xwe ji komkujiyan rizgar bikin, xwe li Şehbayê girtin.” Mistefa ji Parlamenta Ewropayê, Yekîtiya Ewropayê, saziyên alîkariyê yên însanî û saziyên mafên mirovan xwest ku li pêşberî dagirkerî û rewşa sivîlan a li Efrînê bêdeng nemînin. Mistefa got, “Demografiya Efrînê tê guhertin. Terora Erdogan naxwaze krîza li Sûriyê çareser bibe. Îro li Efrînê ye, sibe wê li çar aliyên cîhanê belav bibe.” *R-5*

## Rizgarkirina Efrînê erka her kesî ye



Di 18’ê Hezîranê de Konferansa Rizgarkirina Efrînê hat li dar xistin û derbarê rizgarkirina Efrînê de biryarên girîng hatin girtin. Delegeên Konferansê bi gel re rêzecivînan lidardixin û encamên konferansê dinirxînin. Li navçeya Kefer Naya, gundên Babis û Um El Hoş yên Şehbayê bi beşdariya sedan welatiyan civîn hatin lidarxistin. *R-6*

## Divê li hember êrîşan em yekîtiya xwe ava bikin



Êrîşên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê û hewldanên dagirkirinê di rojeva hemû Kurdan de ye. Hunermendê Kurd Nasir Rezazî li dijî êrîşan banga yekîriyê li hêzên siyasî yên Kurd kir û got, “Ger ku Kurd yekîtiya xwe ava bikin wê ti dewletek nikare êrîşî Kurdistanê bike.” *R-7*

## Divê jin ji bo Efrînê bi erka xwe rabin



Şandeyeke Kongreya Star ku li başûrê Kurdistanê ye, serdanên xwe ji rêxistin û saziyên jinan re berdewam dike. Şandeyê serdana Navenda Eniya Gel a Demokratîk a li bajarê Silêmaniyê kir û bi hevseroka wê Şêrîn Murad re civiya. Şandeyê diyar kir ku pêwîst e rêxistinên jinan ên Kurdistanê û cîhanê bi rol û erka xwe li hemberî jinên Efrînê rabin û rê li pêşiya destdirêjiyên Tirkiyê bigirin. *R-3*

## Bang li jinên ciwan kirin



Li bajarokê Sengeserê ya ser bi Ranya Rêxistina Jinên Ciwan ên Têkoşer li dijî dagirkeriya dewleta Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistanê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de hate gotin hedefa dewleta Tirk dagirkirina hemû başûre û bang li ciwanan kirin û têkoşîna xwe bilind bikin. *R-3*

## Li Efrînê bi navê Kurd tiştek nemaye

Artêşa Tirk û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin bi her awayî zilmdariyê berdewam dikin. Welatiyê Efrînê yê bi navê A.X, ku ji bo bimîne vegerî Efrînê lê ji ber kiryarên çeteyan nikaribû lê bimîne û Efrînê diterikîne. A.X dibêje, “Li Efrînê li ser navê Kurdan tiştek nemaye. Hemû gund xerîb tije kirine. Heta dagirker li wir bin, ez venagerim.” *R-4*

## Rapor rastiya rewşa li Efrînê nîşan nade



Meclisa Sûriya Demokratîk MSD’ê daxuyaniyeke nivîskî da û rapora şandeya navneteweyî ya ji bo Sûriyê yên girêdayî rewşa Efrînê rexne kir û got, “Em têkildarî tişta girêdayî Efrînê hatiye kirin bi guman in û rastiya welatiyên me li Efrînê venabêje. *R-4*

## Tirkiye dixwaze destkeftiyên Başûr tine bike




Nûnerê PYD’ê yê li Başûr Kurdistanê Silêman Ereb diyar kir ku dewleta Tirk bi hênceta şerê li dijî PKK’ê êrîşên xwe li ser başûrê Kurdistanê berfireh kirine, dixwaze tevahiya başûr dagirk bike û destketiyên li başûr tune bike. Ereb got, “ev êrîş li ser tevahî gelê Kurd e.” *R-4*

## Rêjîmê topbaran kir, 93 kes mirin



Hêzên Rêjîma Sûriyê bajarê Derayê û gundewarên wê yên rojhilat û rojava topbaran kir. Di encama topbaranê de 93 sivîlan jiyana xwe ji dest dan. Di encama topbaranê de 3 nexweşxane ji warê xizmetê derketin. Çavdêrî ya Sûriyê ya Mafê Mirovan destnîşan kir ku êrîş di roja 9`an de zêde bûne. *R-2*

## Rûhanî: Emê teslîmî DYA nebin



Li qeyraneke siyasî û aborî rû daye û çalakiyên esnafan jî dewam dikin. Rûhanî anî ziman ku DYA, zexten aborî û siyasî li welatê wan dike û got, “Em ê teslîmî DYA’yê nebin. Ji ber qeyranê hinek derdorên mixalif bangawaziya îstîfayê li hikumetê kirin. Serokkomarê Îranê Hesen Rûhanî, bersiveke hişk da mixalifan û diyar kir ku hikumet wê îstîfa neke. *R-5*

## Di mîtînga aştiyê de 8 kes mirin *R-2*

## Rastî nas kir, jiyana wê guherî *R-3*

# Rêjîmê topbaran kir, 93 kes mirin

***Hêzên Rêjîma Sûriyê bajarê Derayê û gundewarên wê yên rojhilat û rojava topbaran kir. Di encama topbaranê de 93 sivîlan jiyana xwe ji dest dan. Di encama topbaranê de 3 nexweşxane ji warê xizmetê derketin. Çavdêrî ya Sûriyê ya Mafê Mirovan destnîşan kir ku êrîş di roja 9`an de zêde bûne.***

Hêzên Rêjîma Sûriyê bajarê Derayê û gundewarên wê yên rojhilat û rojava topbaran kir. Di encama topbaranê de 93 sivîlan jiyana xwe ji dest dan.
Di encama topbaranê de 3 nexweşxane ji warê xizmetê derketin.
Çavdêrî ya Sûriyê ya Mafê Mirovan destnîşan kir ku êrîş di roja 9`an de zêde bûne.
Gelek dewletên rojavayî weke DYA, Fransa û Brîtaniyayê bang li Rûsiyayê kirin da ku bi rêzî nêzê peymanên xwe li başûrê Sûriyê bibin û êrîşên hêzên Rêjîmê rawestîne.
Hêzên Rêjîmê di 19`ê Hizîranê de dest bi êrîşên li ser Deraayê kir. Gelek pêşketin bidest xistin û herêmên gundewarên rojhilat kir bin serweriya xwe û bi vê yekê çekdarê opozisyonê kir du perçe, her wiha êrîşên xwe berfireh kir.
Çavdêriya Sûrî ya Mafê Mirovan da zanîn ku 93 sivîl di nav de 6 zarok jî di encama tevgera leşkerî



de jiyana xwe ji dest dan.
Li aliyekî din jî li herêma bakurê Dera ji ber topbarana hêzên opozisyonê 12 leşkerên Sûriyê hatin kuştin
Li rojhelatî bajarê Dera jî şerekî giran li derdora baregeha ezmanî rû dide. Ev piştî ku hêzên rêjîmê xwest ku herêmên di bin serweriya opozisyonê bixin bin kontorla xwe pêk hat.

## QSD`ê nasnameyên 2 şervanên xwe yên şehîd eşkere kir




QSD'ê nasnameyên 2 şervanên xwe yên ku di Qonaxa Duyemîn a pêngava Bagera Cizîrê de şehîd bûne, eşkere kir.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) li ser malpara xwe ya fermî bi daxuyaniyekê nasnameyên 2 şervanên xwe yên di pêngava Bagera Cizîrê de şehîd bûn, eşkere kir.
QSD'ê destnîşan kir ku şervanên wan Mehmûd Xelef û Ehmed Mihêmid di berxwedana li dijî çeteyên DAIŞ'ê de şehîd bûne.
Fermandariya Giştî ya QSD'ê ji malbatên şehîdan re sersaxî xwest û soza şopandina rêya şehîdan da.
QSD'ê têkildarî mijarê ev agahî parve kir:
"Di çarçoveya şerê hêzên me li dijî çeteyên DAIŞ`ê de ya li Reqayê di pêngava Bagera Cizîrê de dabû destpêkirin, 2 şervanên me bi lehengî şer kir û şehîd ketine. Em wek Hêzên Sûriya Demokratîk sersaxiyê ji malbatên şehîdan re dixwazin û soza şopandina rêya şehîdan didin."

## Di mîtînga aştiyê de 8 kes mirin



Di teqîna çalakiya ji bo aştiyê ya li gundekî eyaleta Loger a dikeve Başûrê rojhilatê Afganistanê pêk hat de, 8 gundiyan jiyana xwe ji dest da.
Ji agirbesta di navbera Talîban û hikûmetê ku ji Cejna Remezanê û vir ve ya li Afganistanê her ku diçe meş û mîtîngên aştiyê zêdetir dibin.
Di dema çalakiya li gundê Îsmaîhîl a girêdayî bajarokê Şarkh a eyaleta Logerê teqînek pêk hat. Rêveberê bajarok Mûhammed Hanîf Hanafî diyar kir ku hemû kesên di teqînê de jiyana xwe ji dest dayîn her 8 kes jî sivîl in, 4 kes jî birîndar bûne. Heta niha kesê teqîn li xwe negirtiye.
Beriya niha 'Meşa aştiyê' ya ku bi dehan kes tevlî bibû, di nava 40 rojan de 700 km rê meşiya bûn û 18'ê Hezîranê gihiştibû paytext Kabîl. Ev meş destpêkê ji 7 kesan destpê kiribû, piştre jî bi dehan kes tevlî bibû.
Roja Çarşemê jî komeke ji 25 kesan ji Kûnarê dest bi meşê kiribû. Meş wê heta Helmandê bidome.
Ji roja Yekşemê û vir ve li kampeke koçberan a li Pakistanê 15 Afganî, piştî ku sînorê nava her dû welatan derbas kir û şûnde dest bi çalakiya rûniştinê kirin.

## AKP dixwaze parlementerekê desteser bike

Li Colemêrgê HDP'ê, ji bo 4 hezar 800 dengên hatî betalkirin serî li desteya hilbijartinê ya bajêr da.
Li gorî encamên ne fermî yên hilbijartinê ku hatine eşkerekirin, li Colemêrgê HDP'ê ji sedî 70,2 rêjeya dengan girtiye û 3 parlamenter bi dest xistiye. Lê belê li bajêr 4 hezar 800 deng hatibûn betalkirin. Her wiha bi van



dengên hatî betalkirin û dengên ji derveyî welêt hatî AKP dixwaze li ser hesabê xwe qeyd bike û parlamenterekî bistîne.
Komîsyona HDP'ê ya hilbijartinê, ji bo dengên 3 sindoqên navenda bajêr, 13 sindoqên Şemzînanê, 3 sindoqên Geverê û 3 sindoqên Çelê serî li Desteya Hilbijartinê ya Navçê dabû. Li ser redkirina vê serîlêdanê, duh dîsa serî li Desteya Hilbijartinê ya Bajêr hat dayîn.
Tê payîn ku îro nîvro serîlêdan bigihije biryarekê.

## Soylu: Min gef li Bûldan xwar

Suleyman Soylû qebûl kir ku wî gef li Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan xwariye.
Wezîrê Karê Hundir ê Tirkiyê Suleyman Soylû di serdana Serokatiya Navçeya Esenlera Stenbolê ya AKP'ê de li xwe mikur hat ku wî bi telefonê gef li Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan xwariye.
Soylû diyar kir ku, wî ferman daye ku ji niha û şûnde bila hevserokên bajaran ên CHP'ê jî tevlî merasîma veşartina leşkeran nebin.

**BI MIRINÊ GEF LÊ XWARIBÛ**



Soylû telefonî Bûldanê kiribû û gef lê xwaribû. Soylû gotibû ku, "Êdî mafê we yê jiyanê tune, hûn diçin ku, biçin."

## Hevdîtina bi Ocalan re dîsa hat asteng kirin

Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo bi muwekilê xwe Ocalan re hevdîtinê bikin cara 767'emîn serî li Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê dan.
Ji parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Mazlum Dînç, Cengîz Yureklî û Muharrem Şahîn, ji bo bi muwekilê xwe Ocalan re hevdîtin bikin cara 767'emîn serî li Serdozgeriya Komarê ya bajarê Tirkiyê Bûrsayê dan.Parêzerên Ocalan ji 27'ê Tîrmeha 2011'an heta niha 766 caran serî li serdozgeriyê dan û dozgeriyê bi hinceta "Muxalefeta Hewayê heye", "Keştî xerabe ye" û "OHAL" serlêdan red kirin.



## Çete li Cerablusê bihev ketin

Çeteyên koma "Mertala Firatê" ya girêdayî dagirkeriya Tirkiyê li gundê Alîpaş ê Cerablusê bihev ketin.
Navenda Ragihandinê ya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê ragihand ku li gundê Alîpaş ê girêdayî Cerablusê ji aliyê çeteyên Tirkiyê ve hatiye dagirkirin beranberî gundê Ereb Hesen ê girêdayî Minbicê çeteyên Koma "Mertala Firatê" bihev ketin.
Navendê diyar kir ku çeteyên li baregeha Tirkiyê ya li wê herêmê ber bi cihê şer ve çûn. Derbarê encamên şerê çeteyan de agahiyên zelal nehatin bi destxistin.
Ji aliyê din ve hate ragihandin ku li navenda bajarê Cerablusê êrîşeke bi wesayîteke bomebekirî rû da.
Li gor nûçeya ANHA'yê li aliyê rojavayê bajêr êrîşeke bi wesayîteke bomebekirî rû da. Derbarê encamên êrîşê de tu agahî nehatin bi dest xistin.



## Hêzên rejîma Îranê kolberekî din kuşt



Hêzên çekdar ên rejîma Îranê li ser sînorê Rojhilat û Başûrê Kurdistanê êrîş birin ser kolberan û kolberek kuştin, yek jî birîndar kirin.
Li gorî nûçeya RojNewsê, roja 26'ê Hezîranê li rêze çiyayên Qendîl yên derdora bajarê Pîranşarê yê ser bi parêzgeha Ûrmiyê ya Rojhilatê Kurdistanê, pasdarên Îranê êrîş birin ser komek ji kolberan.
Ji ber êrîşê, welatiyê bi navê Şiwane Mehmudzadeyî (25) ku bavê zarokek bû hate kuştin.
Her wiha welatiyê bi navê Nasir Ebdulgulale jî birîndar bû.



# Ger yekîtî hebe kes nikare êrîş bike

***Êrîşên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê û hewldanên dagirkirinê di rojeva hemû Kurdan de ye. Hunermendê Kurd Nasir Rezazî li dijî êrîşan banga yekîriyê li hêzên siyasî yên Kurd kir û got, "Ger ku Kurd yekîtiya xwe ava bikin wê ti dewletek nikare êrîşî Kurdistanê bike."***



Hunermend Nasir Rezazî li dijî êrîşên dagirkeran û ji bo parastinê banga yekîtiyê li gelê Kurd kir û diyar kir ku eger Kurd yekgirtî bin dewleta Tirk nikare êrîşî Kurdistanê bike.
Hunermendê Kurd Nasir Rezazî li dijî dagirkeriya dewleta Tirk bang li gelê Kurd kir ku yekîtiya xwe pêk bîne.
Rezazî diyar kir ku sedemê sereke yê dagirkeriyê hevnegirtina aliyên siyasî yên Kurdane û got; "Eger partiyên me yekgirtî bin û destên xwe bidin destê hev, pirsgirêkên navxweyî çareser bikin , ne tenê Tirkiye, Amerîka jî nikare êrîş bike ser Kurdistanê, yan jî pirsgirêkan ji bo xelkê çêbike."Rezazî got ku piştî Kerkûk, Efrîn û referandûmê divê aliyên siyasî nakokiyên xwe danin aliyekê û li ser yekbûnê bihizirin û wiha pêde çû; "Ji bo ku êdî artêşên Tirkiyê û Îranê nekarin êrîşî xaka Başûrê Kurdistanê bikin, divê yekîtî pêk were."Hunermend Nasir Rezazî herî dawî da zanîn ku divê her kes li dijî dagirkeriyê tişta ji dest bê bike û wiha got; "Ne tenê hunermend, pêwîste hemû ferdên Kurd li herçar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat tişta ji destê wan bê bikin, ji bo ku pêşiya dagirkeran bigirin."

## *Amedekarî û çalakiyên Yekîtiya Rewşenbîran*



**Melek DEMÎRTAŞ**

Di guhetin û veguhertina civakê de rewşenbîr xwedî rolek bingehîne. Di çarçoveya xebat û çalakiyên Yekîtiya Rewşnbîrên Herêma Cizîrê, ahzirtiyên wekî 2.Pêşengeha Prtûkan, Konferan û çalkaiyên dikin tê kirin.

### HER MEH ÇALAKÎ SER ASTA HERÊMÊ

Têkîldarê mijarê Hevseroka Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê Leyla Ibrahîm da zanîn ku Rewşenbîr, bi ramana ku pêş dixe re xwediyê wê rewşenbîrîyê ya û wiha got: "Wekî Yekîtiya Rewşenbîran 9 şaxên me li hemû bajaran hene û li her 9 bajaran çalakî têne li darxistin. Lê di mehê carekê çalakiyek navendî ser asta Herêmê çi semîner, şevbêrkên helbestî û gûftugoyên rewşenbîrî be tê li darxistin."

### SEMÎR SER REWŞA EFRÎN DÊ Lİ DARKEVE

Leyla diyar ki rku di dema niha hazirtiyên çalakiyek navendî ser asta herêmê wekî semîner tê dikin û wih agot: "Ewî Yekîtiyê Semîner ser asta Herêmê ser rewşên dawî li sûriyê û taybet li guhertina dîmografiya Efrînê. Di heman demê de bê rol û misyona rewşenbîran têde çiye û pêwîste em çibikin, dê di destpêkêa meha Tîrmehê de li Qamişlo bê li darxistin. Her wiha wê li ser van mijaran nîqaş di nav rewşenbîr û gel bê kirin."

### ARMNAC HÊZDAYÎNA PÊNÛSNA NE

Leyla da zanîn ku ji bo amedekariyên 2.Pêşengeha Pirtûkan wekî Yekîtiya Rewşenbîran bi Desteya Çandê re alîkarin, ku Yekî 10 prtûk çabkirine, da ku beşdarî pêşengehê bibin. Ji ber ku armanca me çand û wêje rê di nav civakê de pêş bixin û pênûsa rewşenbîran bi hêz bikin, kesên ne endamê yekîtiyê ne, lê naveroka pirtûkên wan başbûn me ew pirtûk çabkirin."

### AMEDEKARİYÊ 3.KONFERANSÊ TÊ KİRİN

Di çarçoveya çalakî û amedekarî Yekîtiya Rewşenbîran de hazirtiya 3.konferansa xwe dikin û Leyel anî ziman ku "Konfernsa Yekîtiya rewşenbîran ser asta Herêma Cizîrê ku her du slan çarek tê li darxistin, her wiha ji bo guhertina rêzîknameyê jî nerîn û pêşniyar ji rewşembîran civîna li bajaran tê lidarxistin. tê payîn ku dê Konferans di meha Tebaxê de bê lidarxistin."

### ÇALAKİYA PİŞTGİRTİYA SERÎHİLDE

Hevseroka Rewşenbîrên Herêma Cizîrê Leyla Ibrahîm bi bîrxist ku Navenda çand û hunera Kevana Zêrîn amedekariyê Pêşengeha wênesaz, prtûk û helbestan dikin, em wekî Yekîtiya Reşenbîrên jin bi vê çalakiyê re jî alîkarin. Her wiha ev çalakî wê li bajarê Dêrikê ser du rojan 2 û 3 Tîrmehê bê li darxistin. kevana zêrîn bê rabe em alîkarin. Û wiha bi dawî kir: "Ku armnac ji vî pêşengehê piştgirtiya hemleya Serî Hilde ku Ciwan pê rabûne bikin."

## Pirtûka şehîdên berbanga sibehê



Welatiyê bi navê Ednan Elî çîrokên şehîdên komkujiya 25'ê hezîranê ya Kobanê di pirtûka binavê "Jînameya Şehîdên berbanga sibehê" de kom kir.
Çeteyên DAIŞ'ê di 25'ê hezîrana sala 2015'an de li bajarê Kobanê komkujî pêk anî. Di komkujiyê de li Kobanê û Berxbetanê 233 sivîl şehîd bûn.
Welatiyê bi navê Ednan Elî ji beriya 3 meh û nîvan dest bi berhevkirina çîrokên şehîdên komkujiya Kobanê û Berxbetanê kir. Armanca wî ji berhevkirina wan ew e ku çîrok û serpêkhatyên wan bike pirtûk.
Ednan bi hevkariya Îlham Misko ji destpêka meha adara borî de dest bi berhevkirina çîrokan kirin. Pirtûk du beş in, beşa yekemîn çîrokên şehîdên Berxbetanê ye û beşa duyemîn çîrokên şehîdên Kobanê ye. Ednan beriya du mehan beşa yekemîn bi dawî kir û ji bo çapê şandibû Qamişlo û niha di van rojan de li benda pirtûkê ye da ku weke diyarî li malbatên şehîdên komkujiyê belav bike.
Ednan Armanca nivîsîna pirtûkê wiha anî ziman: "Di dîrokê de gelê kurd rastî gelek komkujiya hatiye. Ev komkujî n hatiye belgekirin. Ji lewra me xwest ku em vê komkujiyê belege bikin da ku her di bîra dîrokê de bimîne."
Ednan behsa astengiyên ku rastî wî hatine kir û got: "Ji ber ku em di karê nivîsê de nû ne, em di warê teknîkî û nivîsê de rastî gelek astengiyan hatin. Lê ew astengî nebûn kelem li ber derketina beşa yekem a pirtûkê."
Ednan heta niha hîn dest bi nivîsandina beşa duyemîn apirtûkê nekiriye. Bavê Ednan Elî di komkujiya 25'ê hezîranê şehîd bû…*ANHA*

## Qabilyeta zarokan cihê afrîneriyê ye

**Ferîşte NEZÎR**



Bi armanca ku afrîner û berhemdarên çandû huner û werzîşê li gel şagirtan pêşbixin. Komîteya çalakiyên dibistanan yên çand û huner û werzîşê, navendên perwerdekirina şagirtan ser amûrêm mûzîk, şano, dîlan û werzîşê di bin sîwna Desteya perwerdeê ya Herêma Cizrê û bi alîkariya KPC'ê beriya du mehan li bajarê Qamişlo ya milê Şerqê hate vekirin.

### NAVENDA PERWERDEKİRİNA ŞAGİRTAN

Têkîldarê mijarê Rêvebira Navenda Perwerde kirina şagirtan a çand, huner û werzîşê Civîn Ebid ser armanc û çawaniya dayîna perwerdê ev agahî dan: "Di bin sîwana Desteya Perwerdê ya Herêma Cizîrê û bi alîkariya KPC'ê li dibistna Ilmaza Xelîl a milê Şerqê navenda perwerde kirina şagirtan ser mûzîk, govend, şano û werzîşê beriya du mehan bi hte ckirin. Armanc ê ku afrandin û pêşxistina berhemdarên şagirtan pêşbixin, her wiha di dema demsala havînî û dema ku şagirtan dibistanê diqedînin, da ku dema wan vala derbas nebe bi hînkirina çand û werzîşê tijî bikin."

### Jİ 8 HEYA 18 SALÎ SER ÇAND Û HUNER TÊNE HÎNKİRİN

Civîn bal kişand ser xebat û tevlî bûna şagirtan û got: "Şagirt ji 8 heye 18 salî dikarin li navenda me qeyd bikin, her wiha ev şagirtana ser hemû beş û cureyên çand û huner û werzîşê têne perwerde kirin. Mamosteyên taybet ji bo perwerde kirina şagirtan hane, perwerde ji demjimêra 8 heye 12 nîvro vekiriye, lê dema ku dibistan vebin dê wê ji demjimêr 4 piştî nîro ya 7 êvarî be. Her wiha di dema pêş de dê navendek li milê Xerbî jî bêvekiri."
Civîn diyar kir ku haye niha nêzî 200 şagirtî xwe li gel wan qeyd kirine û wiha dom kir: "Lê niha tenê 50 şagirt tên perwerdên xwe dibînin. Her wiha dema perwerdê du meh heya sê meha ye."

### 200 ŞAGİRT XWE QEYD KİRİNE

Civîn Ebid wiha bi dawî kir: "Ev şagirtana netenê perwerdê dibînin, her wiha beşdarî çalakiyên huner û werzîşê jî dibin. Ku di 1.mihrîcana dibistanana çand û hunera li navenda Mihemed Şêox a çand û huner li bajarê Qamişlo li ser 4 rojan hate li darxist beşdar bûn, her wihabeşdarî çalakiyên pirşbirên di nevbera dibistnan de jî dibin."

# Rizgarkirina Efrînê erka her kesî ye

***Di 18'ê Hezîranê de Konferansa Rizgarkirina Efrînê hat li dar xistin û derbarê rizgarkirina Efrînê de biryarên girîng hatin girtin. Delegeên Konferansê bi gel re rêzecivînan lidardixin û encamên konferansê dinirxînin. Li navçeya Kefer Naya, gundên Babis û Um El Hoş yên Şehbayê bi beşdariya sedan welatiyan civîn hatin lidarxistin.***

Delegeyên Konferansa Rizgarkirina Efrînê derbarê nirxandin û biryarên konferansê de hatin standin rêzecivînan li dar xistin.
Civîn li navçeya Kefer Naya, gundên Babis û Um El-Hoş ên kantona Şehbayê bi amadebûna bi sedan welatiyan hatin lidarxistin.
Di civînê de nêrîn û pêşniyarên welatiyan hatin girtin.
Di civînan de encamneya Konferansa Rizgarkirina Efrîne hate xwendin, her wiha nîqaş û axaftinên di konferansê de hatin kirin, ji welatiyan re hatin vegotin.
Endamên konferansê, bal kişandin ser kêmasî û şaştiyên ku di saziyên sivîl û leşkerî yên Efrînê de hatin kirin destnîşan kirin û li hemberî kêmasiyan girîngiya girtina tedbîran hate destnîşankirin.
Hate gotin ku ji bo parastina jiyana sivîlan ji teknîka pêşketî ya şer divê şikeft û spartgeh werin amade kiirn.
Beşdaran jî, ji bo derbaskirina kêmasiyan nêrîn û pêşniyarên xwe gotin û diyar kirin ku ew amade ne li kêleka şervanên YPG û YPJ'ê bisekinin û berxwedaniya xwe berdewam bikin ta Efrîn azad bibe û gel vegere warê xwe.
250 endamên saziyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a kantona Efrînê 18'ê Hezîranê de Konferansa Rizgarkirina Efrînê lidar xistin. Konferans 4 rojan berdewan kir û bi girtina biryarên derbarê rizgarkirina Efrînê de bi dawî bû...*ANHA*



## Li jiyana koçberiyê têkoşîna zarokekî



Zarokê bi navê Hisên Ebdullah yê 13 salî ji ber êrîşên balafiran û hilweşandina bajarê Helebê neçarî koçberiyê bû û di kampeke koçberan ya li Bakurê Sûriyê de bi cih bûye û niha xwarin û şîraniyên ku koçberekî dane wî difiroşe û pê debara malbata xwe dike.
Zarokê bi navê Hisên Ebdullah bi temenê xwe 13 salî ye û ji bajarê Helebê piştî ku mala wan di encama êrîşên balafiran de hat hilweşandin, tevî malbata xwe koçberî kampa Eyn Îsa ya Bakurê Helebê bûye. Hisên du birayên wî yên jê biçûktir jî hene. Piştî ku malbat koçberî bajarê Minbicê bû, beriya salekê bavê zarokan di encama parçeyekî topa çeteyên DAIŞ'ê de birîndar û astengdar dibe.
Êşa malbata Hisên li rex paşguhkirina rêxistinên mirovî ji rewşên koçberan re, ku divê wekî hemû zarokan cihê xwe di dibistanekê de bigire, ji ber berpirsyariya wî ya mezin neçar ma ji dibistana xwe dûr bikeve.
Piştî ku malbat gihaşt kampa Eyn Îsa, Hisên di xwaringeheke navçeya Eyn Îsa de xebitî û piştre di kampê de cihek ji xwe re dît û niha tê de xwarin û şîraniyên zarokan difiroşe.
Hisên El-Ebdullah diyar dike ew rojane nêzî 500 lîreyên Sûriyê qezenc dike û pêdiviyên malbata xwe pê b cih tîne.
Hisên diyar kir piştî ku mala wan a Helebê hilweşiya û ew neçarî koçberiyê bûn, ew neçar ma dest ji xwendina xwe berde da ku bikare debara malbata xwe bike.
Hisên bang li rêxistinên mirovî kir ku zarokan biparêzin û alîkariyê bi malbatên wan re bikin...*ANHA*

## Wê ji nûve rih bidin darên zeytûnan



Buroya Çandiniyê a girêdayî Meclisa El-Mehmûdlî ya rojavayê herêma Tebqayê hewl dide bi sedan daran ji hişkbûnê biparêze.
Zêdeyî 400 darên zeytûnan ên bajarokê El-Mehmûdlî ya girêdayî Tebqayê ji serdema dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê ve hatine paşguhkirin. Bi taybetî di serdema çeteyên DAIŞ'ê de avdana van daran hatibû qedexekirin û çeteyan gelek ji van daran birrîn.
Ev dar li ser rûpîvaneke bi qasî 12 doniman li rojavayê Tebqayê hatine çandin. Bi armanca parastina van daran ji hişkbûnê, Buroya Çandiniyê ya girêdayî Meclisa El-Mehmûdlî wê ji nûve daran bikesixîne û av bide.
Girêdayî mijarê endamê Rêveberiya Buroya Çandiniyê Elî Mihemed wiha got: "Ev baxçeyê darên zeytûnan di van salên borî de hatibû paşguhkirin. Bi armanca vejandina vî baxçeyî em ê van daran ji hişkbûnê biparêzin."...*ANHA*

## Ji kooperatîfa masiyan projeyeke nû



Buroya Kooperatîfan hewl dide projeyeke xwedîkirina masiyan pêk bîne.
Buroya Kooperatîfan dest bi projeya xwe ya xwedîkirina masiyan kir û ev nêzî mehekê ye mijarê lêkolîn dike. Di lêkolînê de qezencên aborî hatin diyarkirin, bi taybetî proje bi sponsoriya Desteya Aborî ya Herêma Tebqayê û bi beşdarbûna welatiyan pêk tê.Kooperatîfê dest bi paqijkirina golên masiyan kir û wê masiyên karp tê de bêne xwedîkirin. Golên masiyan ji du beşan pêk tên û her yek ji wan ji 10 xefikên xwedîkirinê pêk tên. Di her goleke masiyan de ji 2 heta 5 ton masî tên xwedîkirin.Bi rêya van kooperatîfên xwedîkirina masiyan, gelek derfetên kar ji welatiyên herêmê re tên peydakirin, her wiha pêdiviya welatiyan a goştê masiyan bi cih anîn…*ANHA*

## Pêşdibistana bi navê Emel hat vekirin




Piştî ku Tebqa ji çeteyên DAIŞ'ê hate rizgarkirin, kar û xebatên perwerdeyê jî ji nû ve dest pê kir. Meclisa Jinan a Tebqayê navendeke pêşdibistanan a nû vekir.
Li Teqqayê bi serkêşiya Meclisa Jinan navendeka nû ya pêşdibistanan bi navê Pêşdibistana Emel hate vekirin. Hevseroka Meclisa Zagonsaz a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Reqayê Rewşen Hemê û hin mêvanên ji herêma Sirîn û Kobanê beşdarî şahiya vekirina navendê bûn.
Navenda ku hate vekirin, ji 3 odeyan pêk tê û dê ji bo perwerdekirina zarokan û fêrkirina wan bixebite. Her wiha di navendê de hemû pêdiviyên zarokan ji bo lîstikan hene.
Rêvebera Meclisa Jinan a Tebqayê Sûad El-Reşîd diyar kir ku ji mafê zarokan e ku azad bijîn û bi lîstokan bilîzin.
Paşê deriyê navenda pêşdibistanê ji aliyê malbatên şehîdan ve hate vekirin û şêranî li kesên amade hate belavkirin.Hêjayî gotinê ye ku piştî Tebqa di 10`ê Gulana çûyî de ji aliyê Hêzên Sûriya Demokratîk de hate rizgarkirin, Meclisa Jinan ji bo pêşwazîkirina zarokan û perwerdekirina wan karê avakirina navendên pêşdibistanan didomîne…*ANHA*

## Li Reqayê rewş arame



Hêzên Ewlekariya Hundir a Reqayê 3 roj beriya niha li dijî şaneyên razayî yên çeteyên DAIŞ li bajêr operasyonek da destpê kirin. Di encamê de 140 çete hatin girtin, gelek çek û cebilxane hat desteser kirin.
Bajarê Reqayê beriya 8 mehan ji aliyê şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ve hate rizgarkirin. Piştî rizgarkirina bajêr komên çete yên veşartî dixwazin tevlîheviyê li herêmê derxin. Heta niha ji aliyê van çete û komikan ve hinek teqîn li bajêr hatin kirin, mayîn hatin çandin û her wekî din dixwestin zextê li ser gel bikin. Li ser vê yekê Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Reqayê 3 roj beriya niha li dijî van çeteyan û komikan li tevahiya bajêr operasyonek berfireh da destpê kirin.
Di encama vê operasyona ku du rojan dewam kir de gelek çete hatin girtin. Her wiha miqdarek çek û cebilxane hate desteser kirin.
Piştî vê operasyona taybet ya li Reqayê, niha li bajêr rewş asayî ye û gel jiyana xwe ya rojane berdewam dike.

## RAMANÊ RÊBERTIYÊ



### Sosyalîzm û Kapîtalîzm -2-

**Abdulah Ocalan**

Tevî îdeaya wê ya zanistîbûnê û rexnegiriya wê hemûyî, di serî de sosyalîzmên pêkhatî yên Rûsya û Çînê di gelek ezmûn û ceribandinan de hat dîtin ku ji sosyalîzma zanistî bi temamî nehatiye ji avahiyên çanda maddî ya moderníteya kapîtalîst (saziyên ekonomîk, civakî û polîtîk), ji zêhniyet û cîhana wê ya zanistî bibihure. Kes nikare îddîa bike ku şoreşên sosyalîst bi temamî têkçûne, û hatine pûçkirin. Şoreşên em behsa wan dikin mîrateyeke mezin li pey xwe hiştin û kes nikare înkar bike ku hê jî di jiyana rojane de hêmanek in ku dest ji wan nabe û hêza herî zêde bi hêvî ya cîhana zêhniyetê ne. Lê nikarîbûn cihêwaziya şaristaniya alternatîf û moderníteyê mezin û xurt bikin. Di nava moderníteya kapîtalîst de bi giranî heliyan û nikarîbûn xwe ji vê aqûbetê rizgar bikin. Ev rastî ne qeder û çarenûs bû, îro têra xwe eşkere bûye ku bi wan pirsgirêkan re têkildar e, ku sosyalîzma dema kapîtalîzmê nikarîbû çareser bike.
Bi destpêka pîşesaziya kapîtalîzmê re guftûgoyên der barê civakê de girîng in. Di vê demê de hewl didin utopyayên sosyalîst li ser bingehekî zanistî û xeteke çalakiyê deynin. Lê di binê hemûyan de fikra Rohnîbûnê heye ku ji binî ve ji rabihuriyê qut bûye. Fikra Rohnîbûnê bi awayekî diyalektîkî ji rabihuriyê nebihuriye, ji rabihuriyê ji binî ve qut bûye, lewma bi xurtî tesîr kiriye li pêvajoya dused salên paşê. Bi awayekî rahiştine diyardeyan mîna ku ji nû ve têne avakirin, ti têkiliya wan bi rabihuriyê û rêûresmê re tineye. Û heta her tiştê bi rabihuriyê re têkiliya xwe heye bûye mijara nirxandinên negatîf. Herçiqasî mirov li gorî paradîgmaya nû vê helwestê fêhm bike jî eşkere ye ku wê rastiya civakî berevajî bike û nîşan bide. Bêguman kapasîteya heqîqetê ya fikra Rohnîbûnê bi gelek aliyên xwe (ne bi temamî) di ser serdemên beriya xwe re ye. Eger wisa nebûya, jixwe nikarîbû serdema nû biafirîne. Lê wexta em dibêjin wisa bû, nayê wê maneyê ku bi temamî heqîqetê di nava xwe de dihewîne. Lê îdeaya tevahiya pêşiyên wê bi vî awayî bû. Çavkaniya pirsgirêkan jî ev îdea ne. Mirov dikare Hegel weke fîlozofê mezin ê fikra Rohnîbûnê, yê ku ew kiriye ber revîzyonê bide naskirin. Dîroka civakî bi awayekî heqê wê bide, felsefeya zanistî jî bi hêzeke ku hê kes nikaribe jê bibihure (ji aliyekî ve) daniye holê. K. Marks ê ji Hegel girtiye, yeqîn kiriye ku wê karibe bi materyalîzmê ji aliyê bi hêz û zêde îdealîst ê felsefeya Hegel bibihure û di vê de jî têkûz tevgeriyaye. Li vir a pirsgirêk ew e, ji hev cihêkirina îdealîzm û materyalîzmê zêde ne girîng e, ji ber ku ne hatiye fêhmkirin, herdu jî bi xwe xwedî xisletên metafizîka îdealîst in. Yeqîn kirine ku du felsefeyê dijber in. Li vir, Marks ji Hegel zêdetir ji xeta Rohnîbûnê bi tesîr bûye. Marks, rabihurî ji bihurînê jî wêdetir bêhukim hesibandiye yan jî ew weke ku bi tenê siya bûyerekê, ya dîmenekî be nirxandiye. Nikarîbûye îdrak û fêhm bike ku rabihurî bi tevahî giraniya xwe 'niha' ye. Di vê mijarê de bi qasî Hegel bi gurçûpêç nîne.



# Rastî nas kir, jiyana wê guherî

***Jina ciwan a bi navê Fatma Konyeklî ya Ereb, piştî ku beşdarî xebatên rêxistinkirinê yên tevgera ciwanan bû jiyana wê guherî û rastiya civakê nas kir. Fatma dibêje, "Beriya ku ez beşdarî nava xebatên ciwanan bibim, min tu wate nedida van xebatan, piştî ku ez tevlê bûm min rastiya jiyana hevbeş nas kir."***



Li dijî paşverûtiyê ez beşdarî xebatên xwebirêxistinkirinê bûm'
Li dijî hin pîvanên civakê yên paşverû ku hebûna jinan înkar dikin, jineke ciwan a ji pêkhateya Ereb serî hilda û beşdarî nava xebatên rêxistinkirinê yên ciwanan bû.
Jina ciwan a bi navê Fatma Konyeklî 23 salî ye û ji pêkhateya Ereb e. Fatma xwendekara Fakûlteya Perwredehiyê ya zanîngeha Helebê ye. Di nava civakeke paşverû de mezin dibe ku jiyana wê dorpêç kiriye. Fatma dibêje dema ku ew dixwazin nêrîneke xwe bidin, divê hezar carî bifikirin.
Piştî ku çeteyên girêdayî Koalîsyona Niştimanî ya Hêzên Opozîsyona Sûriyê taxên rojhilatê bajarê Helebê dagir kirin, rewşa jinan li van taxan kambax bû û di bin perwerdeya olî de qanûn û pîvanên xwe danîn ku hebûna jinan di civakê de tune dike.
Di encamê de Fatma û malbata xwe neçar dimînin ku koçî taxa Şêxmeqsûd bikin.
Li taxa Şêxmeqsûd Fatma bala xwe dide ser çalakiyên saziyên taxê û fikrên neteweya demokratîk û bi taybet xebatên jinên ciwan û weqfên jinan ku hebûn û beşdarbûna jinan di hemû aliyên jiyanê de esas digirin û bi rengên pêkhate û çandên cuda hatine xemilandin. Fatme dibêje ku ev diyarde di civaka wê de tune ye, ji ber vê yekê wê rêya azadiya xwe di nava xebatên van saziyên Şêxmeqsûd de dîtiye.
Di destpêkê de Fatma rastî astengiya razîkirina malbata xwe ya ji bo beşdariya wê di van çalakiyan de hat, lê di dawiyê de karibû malbata xwe razî bike û vê yekê hişt ku kesayeta wê xurttir bibe.
Fatme Qonyeklî cihê xwe di nava xebatên jinên ciwan de wek endamê rêveberiya Yekitiya Ciwanan a taxa Şêxmeqsûd digire û bi hemû hêz û derfetên xwe hewl dide hişmendiyê di nava ciwanan de belav bike.
Fatme Qonyeklî diyar kir piştî ku wê fikr û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abullah Ocalan nas kir, têgehên jiyana hevbeş di nava civak û malbatê de nas kir, bêtir bi jiyanê ve hate girêdan û rastiya jiyana civakî nas kiriye û wê çawa bikaribe civaka xwe ji paşverûtiyê biparêze.
Di vê derbarê de Fatma wiha dibêje: "Beriya ku ez beşdarî nava xebatên ciwanan bibim, min tu wate nedida van xebatan, lê rihê hevaltiyê û xebatên komînal di navbera ciwanan de hişt ku ez bêtir ber bi wan ve bêm kişandin û ez rastiya jiyana hevbeş nas bikim û ji bo min ev rêgezeke nû bû."
Fatma di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku hebûna wê di nava xebatên Yekitiya Ciwanan de armanc jê ew e ku ciwanên hemû beşên civakê xwe birêxistin bikin û got: "Em gelek semîner û perwerdeyan li dar dixin da ku beşdarî xizmeta civakê bibin. Piştî ku ez beşdarî van perwerdeyan bûm min rastiya xwebirêxistinkirinê nas kir."
Endama Rêveberiya Yekitiya Ciwanên Rojava li taxa Şêxmeqsûd Fatma Qonyeklî di dawiya axaftina xwe de bang li hemû ciwanan kir ku beşdarî nava xebatên rêxistinkirinê bibin û ji bo avakirina civakeke exlaqî hişmendiya xwe bi pêş bixin…*ANHA*

## Bang li jinên ciwan kirin



Rêxistina Jinên Ciwan ên Têkoşer bi daxuyaniyekê bang li jinên ciwan û ciwanan kir ku beşdarî çalakiya mertalên zindî ya li Binarê Qendîlê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ji 8'ê Hezîranê ve didome bibin. Li bajarokê Sengeserê ya ser bi Ranya Rêxistina Jinên Ciwan ên Têkoşer li dijî dagirkeriya dewleta Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistanê daxuyanî da.
Endama Rêxistina Jinên Ciwan ên Têkoşer Zîlan Resul daxuyanî xwend. Di daxuyaniyê de wiha tê gotin; "Dagirkeriya dewleta Tirk roj bi roj zêde dibe. Bêdengiya aliyên siyasî yên Herêma Kurdistanê berdewame. Êrîşên dewleta Tirk jî ne tenê niha ne. Bi dehan sale êrîşên dewleta Tirk didomin. Ji ber êrîşan heya niha bi dehan welatiyên sivîl bûne qurbanî. Armanca dewleta Tirk ne PKK ye, welatiyên Başûrê Kurdistanê ye. Ji ber ku dewleta Tirk hemû Kurdan ji bo xwe weke metirsî dibîne."
Bi berdewama daxuyaniyê de wiha tê destnîşan kirin; "Heya niha aliyên siyasî yên Başûrê Kurdistanê nebûne xwedî helwest. Lewma dagirkerî gihîşt vê astê. Me dît li Şengalê çi rû da, niha weke jin em ê qet rê nedîn Şengalekî din li Başûrê Kurdistanê dubare bibe. Heya ku dagirkerî hebe, wê çalakî û xebata me berdewam bikin. Em ê xwedî li xak û welatê xwe derkevîn. Me niha dest bi çalakiya mertalên zindî kiriye, li Binarê Qendîlê. Em bang li ciwanan û jinan dikin ku beşdarî çalakiyê bibin û xwedî li xaka xwe derkevin."

## Li Şengalê ji bo Zîlan civîn hat lidarxistin



Li Kampa Til Ezer a Şengalê ji bo salvegera berxwedêr Zeynep Kinaca (Zîlan) ji aliyê TAJÊ ve civîn hat lidarxitin.
Di 30'ê Hezîrana 1996'an de Zeynep Kinaci (Zîlan) ji bo balê bikişîne ser êrîşên ku li ser vîna gelê Kurd tê kirin, li navenda Dêrsimê çalakiya fedaî pêk anî. Li Kampa Til Ezer a Şengalê ji bo salvegera berxwedêr Zeynep Kinaci (Zîlan) ji aliyê Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) ve civîn hat lidarxitin.
Li ser navê TAJÊ Binevş Tolhildan axivî û got: "Şehîd Zîlan bi çalakiya xwe ya fedaî nîşan da ku jinên Kurd êrîşên dewleta tirk qebûl nakin û teslîm nabin. Di heman demê de Zîlanê tola jinên Dêrsimê sitend. Tu hêzên dagirker nikare hêz û îradeya jin û gelê Kurd teslîm bigire."…*JINNEWS*

## Dewreya jinan a tendurustiyê hat vekirin



Bi armanca pêşxistina rola jin di xebatên tendrûstiyê de Kongreya Star ya Girê Spî dewreyek hemşîreytiyê ji jinên ciwanan re vekir.
Bi tevlîbûna 27 jinên ciwan ên temenên wan di navbera 18-25 salî de, Kongreya Star a Kantona Girê Spî dewreya perwerdê ya hemşîretiyê vekir .
Dewre li navenda Kongreya Star a Kantona Girê Spî rojane saetekê tê dayîn. Perwerde wê heta mehekê bidome.
Piştî qedandina dersên teorik dê perwerdeya pirtûkî li nexweşxaneya Niştimanî were dayîn.
Jina ciwan bi navê Rojda Elûş li ser dewre axivî û got :"îro bi saya kongreya Star dewre hat vekirin û ji ber ku ez ji karê hemşîretiyê hezdikim û dixwazim alîkariya birîndaran bikim, ez tevlî dewreyê bûm"…*ANHA*

## Divê jin ji bo Efrînê bi erka xwe rabin



Hevseroka Eniya Gel a Demokratîk li Başûrê Kurdistanê diyar kir ku pêwîst e jinên Rojava tecrubeyên xwe yên têkoşînê bi jinên cîhanê re parve bikin.
Şandeyeke Kongreya Star ku li başûrê Kurdistanê ye, serdanên xwe ji rêxistin û saziyên jinan re berdewam dike. Şandeyê serdana Navenda Eniya Gel a Demokratîk a li bajarê Silêmaniyê kir û bi hevseroka wê Şêrîn Murad re civiya.
Di serdanê de şandeyê behsa serkeftinên jinên Rojava û Bakurê Sûriyê kir.
Şandeyê behsa destdirêjiyên artêşa tirk a dagirker ya li dijî welatiyên Efrînê de kir û bi taybet jinên Efrînê. Her wiha dane zanîn ku dewleta tirk malbatên komên çete yên girêdayî wê li seranserî Efrînê bi cih dike û siyaseta xwe ya guhertina demografîk li Efrînê berdewam dike.Şandeyê diyar kir ku pêwîst e rêxistinên jinan ên Kurdistanê û cîhanê bi rol û erka xwe li hemberî jinên Efrînê rabin û rê li pêşiya destdirêjiyên Tirkiyê bigirin.
Li aliyê din hevseroka Eniya Gel a Demokratîk serbilindiya xwe bi serkeftinên jinên kurd ên Rojava û Bakurê Sûriyê anî ziman û diyar kir ku pêwîst e alîkariya projeya jinên Rojava were kirin û pêwîst e jinên Rojava jî tecrubeyên xwe yên têkoşînê bi hemû jinên cîhanê re parve bikin.

## Li Reqayê Yekitiya Jinên Ciwan ava dibe



Yekitiya Jinên Ciwan a Bakurê Sûriyê bi armanca avakirina Yekitiya Jinên Ciwan li Reqa û gundewarên wê civînek ji jinên ciwan ên bajar re li dar xist.
Yekitiya Jinên Ciwan a Bakurê Sûriyê bi armanca hilbijartina jinan ji bo avakirina Yekitiya Jinên Ciwan li Reqa û gundewarên wê û bi dirûşma "Bi tekoşîna jinan em ê zîhniyeta koledarî hilweşînin" civînek li dar xist.
Endamên Yekitiya Jinên Ciwan ên Bakurê Sûriyê, jinên Meclisên Herêmî ên Reqayê, Meclisa Jinên Sûriyê ya bajarê Reqayê û gundewarên wê û jinên navçeya Eyn Îsa ya girêdayî herêma Firatê beşdarî civînê bûn.
Endama Yekitiya Jinên Ciwan a Bakurê Sûriyê Medya Mihemed axivî û derbarê avakirina yekitiyê de ku wê di demên pêş de were avakirin û got: "Ev yekitî tenê ji bo jinên ciwan e. Wê komîteyên mîna çand û huner, siyasî, ragihandin, werzîş û perwerde dê werin avakirin."
Paşê hilbijartin hat kirin. 20 jin wek endamên yekîtiyê hatin hilbijartin. Di dawiyê de senevîzyon li ser tundiya li ser jinan di dema ku bajarê Reqayê di bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ`ê de bû û li ser rol û girîngiya jinan di civakê de hatin pêşandan…
*REQA*

# Rapor rastiya rewşa li Efrînê nîşan nade

***Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê daxuyaniyeke nivîskî da û rapora şandeya navneteweyî ya ji bo Sûriyê yên girêdayî rewşa Efrînê rexne kir û got, "Em têkildarî tişta girêdayî Efrînê hatiye kirin bi guman in û rastiya welatiyên me li Efrînê venabêje.***

Meclisa Sûriya Demokratîk agahiyên di rapora şandeya navneteweyî ya ji bo Sûriyê yên girêdayî rewşa Efrînê rexne kirin û bang li meclisê kir ku hemû pêkhateyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li bakurê Sûriyê di komîteya sazkirina destûra Sûriyê de bigire nava xwe.

Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê girêdayî rapora şandeya navneteweyî ya taybet ji bo Sûriyê ku Steffan De Mistura derbarê rewşa mirovî li Sûriyê de pêşkêşî Meclisa Ewlehiyê ya Navneteweyî kiriye, daxuyaniyeke nivîskî li ser malpera xwe ya fermî weşand.

Daxuyanî wiha ye:

"Daxuyaniyeke zelalkirinê ji raya giştî re

Li rex rapora şandeya navneteweyî ya ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê birêz Steffan De Mistura ku di rûniştina vekirî ya Konseya Ewlehiyê ya Navneteweyî de derbarê rewşa mirovî li Sûriyê û xebatên siyasî yên aloziya Sûriyê de hatiye pêşniyarkirin ku di 27'ê Hezîrana 2018'an de hatiye lidarxistin. Di raporê de xemgîniya têkildarî rewşa welatiyên sivîl li başûrê Sûriyê û geşedanên li Deraayê tîne ziman û piştrast dike ku divê bûyerên li Xota û Helebê neyên dubarekirin.

Her wiha di heman demê de behsa encamên Soçiyê yên girêdayî avakirina komîteyeke destûrî û alîkariya dewletên mîsoger ên Soçiyê dike.

Di nirxandina xwe de xwe spart rapora rêveberê çalakiyên mirovî di Neteweyên Yekbûyî de birêz John King û tê de hin tiştên berovajî rewşa heyî li ser erdê dibêje û bi taybet nirxandina wî ya ne zelal ku dibêje nêzî 5 hezar kes vegeriyane Efrînê û Tirkiye xebateke mezin ji bo alîkariya mirovî bi welatiyên li Efrînê re dimeşîne. Em wek Desteya Serokatiya Meclisa Sûriya Demokratîk, têkildarî tişta girêdayî Efrînê hatiye kirin bi guman in û rastiya welatiyên me li Efrînê venabêje. Her wiha rastiya jiyana bêtirî 200 hezar kesên ku ji ber dagirkeriya artêşa tirk û çeteyên wê di 18'ê Adara 2018'an de li Efrînê neçarî koçberiyê hatine kirin, venabêje.

Li ser van agahiyên li jor, em pêşniyar dikin ku şandeya navneteweyî, birêz De Mistura û tîma wî li hemberî tişta ku li Efrînê rû dide bêtir bi berpirsiyarî tev bigerin. Bi taybetî beriya dagirkeriyê herêma Efrînê bi awayekî sivîl û demokratîk ji aliyê hemû pêkhateyan ve bi rêya meclisa wê ya rêveber dihat birêvebirin. Li şûna ku De Mistura pesnê wê rêveberiyê bide ku di aramî û ewlehiyê de di asteke pêş de bû û Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li Efrînê veguherî mînaka herî guncaw ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê û di pêşwazîkirina bêtirî nîv milyon welatiyên ji herêmên ku pesnê wan dide (mîsogerkarên Astanayê) yên li herêmên kêmpevçûn xebateke mezin meşand. Her wiha rola mezin a hêzên wê yên leşkerî Yekîneyên Parastina Gel/Jin (YPG/J) û hêzên Asayîşê di şerê li dijî rêxistinên terorîst ên wekî DAIŞ, Cebhet El-Nusra û komên girêdayî wan ku di bin çavên rêjîma Tirkiyê de û bi fermana wê herêma Efrînê veguherand herêma serwerî û xenîmeyan û xetere li ser jiyana kesên li Efrînê mane çêkir. Li rex wê siyaseta guhertina demografîk bi awayekî sîstematîk li Efrînê dide meşandin ku bi serê xwe sûcekî şer e û divê civaka navneteweyî ji bo rawestandina vê siyasetê asta xebatên xwe bilind bike û hemû aliyên destên wan di vê siyasetê de heye ceza bike.

Avakirina komîteyeke girêdayî destûra Sûriyê, eger hemû pêkhateyên gelê Sûriyê û hêzên ku şerê terorê kirine negire nava xwe û di nava wan de pêkhateyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li bakur û bakurê rojhilatê Sûriyê tune bin, em dibînin ku ev hewldaneke gurkirina şerê Sûriyê ye û veguhestina wê ber bi rêyeke din ve ye. Bê guman encama wê dê sifir be û lehiya rijandina xwîna welatiyên Sûriyeyê dê berdewam bibe. Divê rêbazên zelal û aşkera û tedbîr bêne girtin da ku di encamê de li gorî biryarên navneteweyî yên girêdayî mijarê û di nava wan de biryara navneteweyî ya 2254 aloziya Sûriyê were çareserkirin. Di nava van gavan de gava pêkanîna destûra demokratîk a Sûriyê.

Em ji hemû xebatên avakirina çareseriyeke siyasî ya xurt re amade ne da ku di encamê de şer were rawestandin û kaniyên terorê bêne zuhakirin. Her wiha sîstemeke siyasî were damezirandin ku li gorî Sûriyê û gelê wê be û serweriya wê ku destdirêjiya wê hatiye kirin were vegerandin.

## Tirkiye dixwaze destkeftiyên Başûr tine bike



Nûnerê PYD'ê yê li Başûrê Kurdistanê diyar kir ku dewleta Tirk dixwaze tevahiya Başûrê Kurdistanê dagir bike û bi hinceta şerê dijî PKK'ê êrîşên xwe li ser Başûr berfireh kirine û dixwaze destkeftiyên Başûr têk bibe.

Nûnerê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê yê li Başûr Kurdistanê Silêman Ereb derbarê armanca êrîşên dewleta Tirk li ser xaka Başûrê Kurdistanê axivî û diyar kir ku gelê Kurd di şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê li Rojava û Başûrê Kurdistanê destkeftiyek mezin bi dest xistiye û got; "Ji bo Kurdan giringe ku van destkeftiyan biparêzin. Ji ber dewletên dagirker weke Tirkiyê dixwaze bi van êrîşan van destkeftiyan tine bikin. Naxwaze li Rojhilata Navîn statuyek Kurdan hebe. Ji bo wê jî dewleta Tirk îro sînorên xaka Başûrê Kurdistanê dagir kirine. Dixwaze aramî û îradeya Kurdan tine bike û krîzên xwe yên hundirîn derxe ji dervey welat."

Ereb di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku êrîşên dewleta Tirk li ser tevahiya gelê Kurd e û wiha berdewam kir; "Li Rojavayê Kurdistanê dewleta Tirk piştgiriya çeteyan dikir û êrîşê kantonên Rojava dikir. Gelo ma li wir PKK hebû? Na. Niha jî bi hinceta hebûna PKK'ê êrîşê xaka Herêma Kurdistanê dike. Kurd li kûderê serî rakin, dewleta Tirk êrîşê wan dike. Ji bo wê jî ev êrîş li ser tevahî gelê Kurd e."

Her wiha Ereb bal kişande ser hebûna baregehên leşkerên Tirk li ser xaka Başûr û got; "Her cihê dewleta Tirk dagir kir, bi hêsanî jê dernakeve. Niha li ser xaka Başûr bi dehan baregehên dewleta Tirk hene. Divê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk helwestek netewî û cidî were nîşandan."

Di dawiyê de Silêman Ereb anî ziman ku ger Kurd bixwazin bibin xwedî statû, divê yekîtiya xwe çêbikin û wiha got; "Ji aliyê hinek rayedarên Başûr ve pîrozkirina Erdogan a di hilbijartinên derbasbûyî yên Tirkiyê de, rewakirina êrîşên li ser xaka Başûrê Kurdistanê ye."…

***ROJNEWS***

## Çarenûsa Kerkûkê ne diyar e

Rewşa ewlehiya parêzgeha Kerkûkê her diçe aloztir dibe. Ev jî bûye sedem ku beşek ji welatiyan malên xwe terk bikin.

Demeke li sînorê parêzgeha Kerkûkê kuştin, dizî û revandin zêde bûye û bûye pirsgirêkek mezin. Li aliyek din jî liv û tevgera çeteyên DAIŞ'ê ya li sînorê herêmê zêde kiriye. Ev jî bûye sedem ku çarenûsa ewlehiya Kerkûk bikeve rewşek nediyar.Li gor agahiyan, niha hêzên ewlehiyê li Kerkûk bi armanca parastina ewlehiya bajar û vegera armiya ji bo bajar lijneyek ava kirine. Li bajar ewlehiyek zêde kirine. Belê hîna nekarîne ewlehiya bajar biparêzin.

Di şeva 25'ê Hezîranê de çeteyên DAIŞ'ê êrîşê gundê Elî Sera yê girêdayî bajarokê Daqoqê li sînorê Kerkûkê kirin. Gundê Elî Sera yê Kurdên Kakeyî ye. Di êrîşa çeteyên DAIŞ'ê de welatiyek hate kuştin û 3 welatiyên din jî birîndar bûn. Kurdên Kakeyî bûne armanca êrîşên çeteyên DAIŞ'ê.

Heya niha hêzên Iraqê çend caran li Kerkûkê ji ber gulereşandine li derdorê, çend welatî hatine kuştin û birîndar bûne. Du roj berê jî li Xurmatû cenazeyên 8 welatiyên hatine kuştin hate dîtin.

Rayedarên Kurd ên li Kerkûkê çend caran nerazîbûn nîşanî rewşa xerab a ewlehiya bajar dan û diyar kirin ku wê li ser hêzên ewlehiyê dozê vekin.

Parlamentere YNK'ê li parlamentoya Iraqê Mihemed Osman derbarê rewşa Kerkûkê de dibêje; "Parêzgeha Kerkûkê di nava çend mehên borî de bi planek metirsîdar re rû bi rû bûye. Ev jî bi desteka hinek kes û aliyên siyasî ji bo hedefgirtina tevahî Kurdên li parêzgeha Kerûkê tê kirin. Hewl didin ku Kurdên herêmê neçar bikin warê bav û kalên xwe terk bikin."

Her wiha parlamenterê PDK'ê yê Kerkûk li Bexda Şaxewan Ebdullah jî li ser rewşa Kerkûkê got; "Di demên borî de ji aliyê DAIŞ'ê ve li ser gundên Kakeyiyan, gundên Talebanî û Dawde yên li Daqoqê êrîş pêk hatine. Ji ber vê sedemê tenê di nava du hefteyan de 200 malbatên Kurdan ji malên xwe derketine."

## Li Efrînê bi navê Kurd tiştek nemaye



A.X. ê ji Efrînê ji bo dîtina mala xwe, gundê xwe û ji bo mayinê çû Efrînê, lê belê nekarî bimîne. A.X. ji bo dagirkeran got, "Heta ku ew li wir bin, tiştekî min li wir nîne."

Di ser dagirkeriya artêşa Tirk û çeteyan ya li Efrînê re 3 meh derbas bûn. Li gel dagirkeriyê, talan, revandina mirovan, desteserkirin û guhertina demografiyê jî dewam dike. Hinek ji şêniyên Efrînê ku piştî ji Efrînê derketin li herêmên Şehba û Şêrawa bi cih bûn, ji bo gund û malên xwe sax bikin vegeriyan Efrînê, lê belê bi her awayî kiryarên li dijî mirovahiyê li wan hatin kirin. Efrîniyê bi navê A.X. jî ji bo kontrolkirina mala xwe çû Efrînê. A.X. qala tiştên bi serê wî ve hat, kir:

### KURDAYETÎ NÎNE

"Ji bo dîtina mal û gundê xwe em jî vegeriyan Efrînê. Me dît ku tiştekî me nemaye. Kurd tenê ji aliyê fîzîkî ve hene. Di rastiyê de Kurd lê nemane. Mirov nikarın xwedî li Kurdbûna xwe derkevin. Ji ber vê yekê min got, 'eger mala min, zeytûnên min wê ji dest biçin bila biçin'. Ez ê ji vir derkevim û biçim.

### TALAN DEWAM DIKE

Kîjan çete ketibe nava kîjan gundî ew der êdî bûye yê wan. Dest danîne ser her tiştên gundiyan û talan kirine. Gundê me, xaniyê min jî bi heman rengî ye. Hemû ciwanên Kurd li dijî xwe weke metirsiyê dibînin. Ji ber vê yekê kî dibe bila bibe, bi bahaneykê digirin, êşkenceyê li wan dikin. Her tiştî bi fermana dewleta Tirk dikin. Dema ku malbat li pey zarokên xwe dikevin jî, ji bo berdana wan pereyan jê dixwazin. Malbat neçar dimîne wî pereyî bibîne. Yên ku pereyê xwe nîne jî, zarokên wan tên windakirin.

### XANIYEKÎ VALA NEMAYE

Dema ku tu li nava Efrînê digerî, mîna ku tu li cihekî xerîb digere. Veguheriye bajarekî xerîb. Kurd li wê derê mîna xerîban e. Li navendê û li gundan maleke vala nîne. Temamiya gundan tijî ne. Ji Xota, Hûms û Dêra Zorê anîne. Dema ku li mala yekî bi cih dibin, êdî jê dernakevin. Dema ku gundî dixwazin li gundê xwe vegerin, çekê li wan dikişînin. Nahêlin ku biçin.

### JIYAN LI WIR NABE

Malê dinyayê tev ji te re bimîne jî, ne hêja ye ku mirov di nava wê zext û zilmê de bijîn. Tevî mala min û ya zarokên min, sê malên malbata min ji dest çûn. 10 hezar dolar ji min stendin. Wesayita min çû. Zêrên hevsera min hebûn, min ew jî dan wan. Zarokên min li derve dixebitîn, min pereyê wan ê bi salan dabûn ser hev dan wan. Min hemû li pey xwe hişt û hatim. Nedibû ku di nava wan de bijîm. Ti pîvaneke wan nîne. Tenê talan, dizî û desteserkirinê dikin. Min dest ji hemû mal û milkên xwe berda û hatim. Tiştek ji bo min negirîng e. Heta ku ew li wir bin, tiştekî min li wir nîne."…***ANF***



# Teror wê bi Efrînê sînordar nemîne

***Têkildarî dagirkeriya dewleta Tirk a li rojhilata navîn û vîzyona çareseriyê ya demokratîk a Kurdan li Parlementoya Ewrûpayê (PE) konferansek hate lidarxistin. Komîsyona Hemwelatiyan a Tirkiyê ya Yekîtiya Ewrûpayê, Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, Enstîtiya Kurdan a Brukselê, pêşengî ji konferansê re kirin.***

Li Parlamenta Ewropayê (PE) di konferansa dijî dagirkeriya Tirk de bang li saziyên navneteweyî hate kirin ku bi erk û berpirsyariya xwe rabin.

Konferansa li Parlamenta Ewropayê, li ser dagirkeriya dewleta Tirk a li Efrînê û vîzyona Kurdan a ji bo çareseriya krîza li Rojhilata Navîn hat lidarxistin.

Hevseroka Desteya Rêveber a Kantona Efrînê Hêvî Mistefa bi rêya skype tevlî rûniştina yekemîn bû. Mistefa qala rewşa Efrînê kir û nerazîbûn nîşanî bêdengiya cîhanê da û wiha got: "Şêniyên Efrînê ji bo xwe ji komkujiyan rizgar bikin, xwe li Şehbayê girtin." Mistefa işaret bi şert û mercên giran ên jiyana li Şehbayê û diyar kir ku derfetên wan nîne ku zarokan bibin nexweşxaneyan.

Mistefa ji Parlamenta Ewropayê, Yekîtiya Ewropayê, saziyên alîkariyê yên însanî û saziyên mafên mirovan xwest ku li pêşberî dagirkerî û rewşa sivîlan a li Efrînê bêdeng nemînin.

Mistefa got, "Demografiya Efrînê tê guhertin. Terora Erdogan naxwaze krîza li Sûriyê çareser bibe. Îro li Efrînê ye, sibe wê li çar aliyên cîhanê belav bibe."



Hêvî Mistefa ji bo şêniyên Efrînê jî xwest ku bên parastin û derfet bên afirandin ku karibin bi rengekî ewle vegerin malên xwe.

Di konferansê de encamnameya ji neh xalan hate qebûlkirin. Li gorî vê yekê, pêkhateyên konferansê dagirkeriya dewleta Tirk a li Efrînê "Der Qanûnî" ragihandin.

Di encamnameyê de hate destnîşankirin ku ev dagirkerî li dijî pîvan û hedefên Neteweyên Yekbûyî ye, li hiqûqa navneteweyî nayê û dagirkeriya hêzên Tirk hate şermezarkirin.

Danezana ji neh xalan pêk tê, wiha ye:1- Hêzên Tirk û komên ser bi wan ve, divê tavilê û bê şert yekser ji herêmên Sûriyeyê yên dagir kirine vekişin.

2- Hemû sûcên ku artêşa Tirk û komên wê li Efrînê kirine, ku rê li ber koçberî û krîza însanî vekir, divê werin şermezarkirin û bikevin ber lêpirsînê.

3- Jin, mêr û zarokên hatine revandin, divê bê şert yekser bên berdan û zerarên li wan bûne bên çareserkirin.

4- Der barê windahiyan de pêwîste lêpirsîn bê destpêkirin.

5- Divê komîsyoneke niqûqê ya zelal, bê alî û serbixwe bê avakirin ku ji nûnerên Federasyona Mafên Mirovan a Sûriyeyê û rêxistinên jinan û însanî yên li Sûriyeyê pêk tê. Binpêkirinên mafên mirovan ên ji 20'ê Çileya 2018'an dema destpêkirina dagirkeriya Efrînê û vir ve hatine kirin, divê bên lêpirsîn û berpirsyar jî li dadgehên herêmî û navneteweyî bên darizandin.

6- Ji bo sûcên ku hêzên Tirk ên dagirker û komên wan ji destpêka dagirkeriyê ve kirine bên lêpirsîn û kiryar radestî dadgehên navneteweyî werin kirin, divê bi rêxistinên welatî û mafên mirovan ên Sûriyeyê re hevkarî bê kirin.

7- Divê mirovên ji Efrînê koç kirine karibin bi rengekî ewle vegerin malên xwe.8- Hemû sazî û rêxistinên navneteweyî yên pêwendîdar, pêwîste alîkariya însanî û aborî bidin gelê Efrînê.

9- Li dijî karên nîjadperestî yên hêzên Tirk ên dagirker, ku koçberiya bi zorê û guhertina demografiya herêmê jî di nav de ne, analîzên akademîk û hiqûqî wern kirin û belge li ser bên amadekirin.

## Hikûmet wê îstifa neke

Li Îranê ji ber bihabûna dolar esnafan boykot dabûn destpêkirin. Vê jî bi xwe re pêşî li nîqaşên nû vekir. Li îranê bi piştgiriya gel, qeyraneke siyasî rû da. Ji ber vê qeyrana hatî jiyîn, hinek derdorên mixalif bangawaziya îstîfayê li hikumetê kirin. Serokkomarê Îranê Hasan Rûhanî, bersiveke hişk da mixalifan û gef li DYA'yê xwar.

### KRÎZA EKONOMÎK

Piştî ku serokê DYA'yê Donald Trûmp bi yekalî peymana enerjiya nukleerî betal kir, li ser Îranê polîtîkayên ambargo û dorpêçkirinê, pêşî li qeyranên cîddî vekir. Di demên dawî de li hemberî welatên ku ji Îranê petrolê distînin, DYA'yê xwest ku ji meha Mijdarê û pêde ambargoya petrolê deynin ser Îranê. Lewre dolar di carekê de bilind bû û rê li ber kûrbûna qeyrana aborî ya li Îranê kir. Esnaf û bazirganên Îranê, van rojên borî ji ber qeyranê biryara boykotê dan û xistin meriyetê. Vê boykotê ji derdorekî fireh a civakê jî piştgirî girt û lewma jî hinek derdorên mixalîfan bangawaziya îstîfayê li hikumetê kir.

### BERSIVA BANGEWAZIYÊN ÎSTÎFAYÊ

Serokkomarê Îranê Hasan Rûhanî, di daxuyaniya dayî de, ji ber qeyrana aborî bangên îstîfaya hikumetê red kir.

Rûhanî, di bernameyeke televîzyonê de bersiv da rexne û bangawaziyên îstîfaya hikumetê.

Rûhanî got, "Divê zehmetî û astengiyên civak dikşîne ji holê bên rakirin. Heke em bibin yek, bi biryar li ser piyan bisekinin, em dikarin tevahiya pirsgirêkên xwe çareser bikin. Ji bo bangên îstîfakirina hikumetê jî, vê rêveberiyê 24 mîlyon deng girtine û pêbaweriya 81 mîlyonî wergirtiye. Heke hinek



bêjin wê hikumet bitirse û vekişe kêlekekê, wê şaş bifikirin. Hikumet wê îstîfa neke."

### DYA LI PEY KOMPLOYAN E

Rûhanî anî ziman ku DYA, zexten aborî û siyasî li welatê wan dike û got: "Divê em nîşanî cîhanê bidin ku em dikarin bi zor û zehmetiyên heyî re bijîn, lê em ji serxwebûn û azadiya xwe tu tawîzan nadin. Tu welatperwer serî li ber Amerîkaya derewîn natewîne."

Rûhanî anî ziman ku vekişîna Donalp Trûmp a ji hevpeymana Enerjiya Nukleeriyê, li hemberî welatê wan kompleyek e û wiha pêde çû; "DYA, sîyonîst û kedxwazên din ên li bendê bûn ku piştî Trûmp ji peymanê vekişe, em ê jî vekişin. Lê me ev komplo pûç derxist. Em ê radestî DYA'yê nebin. Em ê rûmeta gelê xwe biparêzin û li ber DYA'yê çong daneynin."

Serokê rûhanî yê Îranê Ayetullah Elî Xameney, li hemberî protestoyên ji bo qeyranên aboriyê bang li darazgeriyê kir ku "Li hemberî kesên ewlehiya aboriyê xirab dikin" bikeve tevgerê.

## Emê destûrê nedin dagirkeriyê



Li Qendîlê li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk çalakiya meratên zindî hatibû destpêkirin.

Ji bajarê Kerkûk yê Başûrê Kurdistanê bi dehan ciwan beşdarî çalakiyê bûn.

Çalakiya 'Mertalên Zindî' ya Tevgera Ciwanên Başûr û Tevgera Jinên Ciwan di 8'ê Hezîranê li Qendîlê ku li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk dest pê kirî, di roja 21'an de didome. Piştgiriya ji bo ciwanan her ku diçe zêdetir dibe. Bi dehan ciwanên ji bajarê Kerkûkê çûn Qendîlê û beşdarî çalakiya berxwedanê ya mertalên zindî bûn.

Ciwanên Kerkûkê diyar kirin ku ji bo bibin mertalê zindî hatine Qendîlê. Ciwanan bal kişand li ser êrîşên dagirkeriyê yên li çar parçeyên Kurdistanê didomin û ragihandin ku ji bo xwedî li Başûrê Kurdistanê derbikevin li Qendîlê ne. Ciwanan diyar kirin ku di demên dawî de dewleta Tirk êrîşên dagirkeriyê li dijî Başûr zêde kirine û wiha gotin; "Bila dijmin baş bizane ku bi ti awayî em ê destûr nedin ku xaka me dagir bikin."

Ciwanan destnîşan kirin ku xaka kevnar a Kurdistanê ne ya firotinê ye û ev peyam dan; "Em ê destûr nedin ku ev xaka pîroz carek din weke Kerkûkê were firotin. Ji bo vê em amade ne ku canê xwe feda bikin."

Ciwanan bang li ciwanên Başûrê Kurdistan û hemû ciwanên Kurdistanê kirin ku xwedî li çalakiya mertalên zindî ya ciwanan a li Qendîlê û Kurdistanê derbikevin.



## Herêma herî bi ewle Efrîn bû

Mihemed SEYDÎ

Dema em behse herêmên bi ewle dikin wê demê şerekî dijwar heye. Hêzên hegemon yên ku li pêyî berjiwendiyên xwe ne û sedemên van şeranin, Ewlehiya li herêmekê ji bo xwe xeterî dibînin.

Lê her ku liv û tevger çêdibe xwe wekî aliyên ku ew ji bo ewlehiya gelanin, midaxeleyî deverên din dikin û xwe wekî xelasker nîşan didin..

Ger em bibêjin xelaskerin wê demê dive li cihên ku xilasî û ewlehî anîne em bibînin û bînin ziman ..

Em werin ser herêma herî bi ewle ya di nava şer û agirê ku çend salin li sûriyê pêketiye de û behse hêzên "xelasker" bikin.

Ew herêm Efrîn ne. li vê herêmê ewlehî hebû û heta herêma herî bi ewle ku bi deh hezaran kesî xwe lê girtibûn. lê ji ber ku ewlehiya li vê herêmê rastiya kom û hêzên li deverên din û hovîtiya wan dida diyarkirin. Ji ber vê sedemê jî, Efrîn ji bo wan û berjiwendiya wan xeter bû.

Ji ber ku dagirkerin wê nikaribin ewlehiyê jî pêk bînin. Li Efrînê ne tenê xwestin ewlehiya li wir xirab bikin, guhertina demografîk û qirkirina etîk jî dan destpêkirin û pêk tînin. Bi vê siyasetê jî dixwazin herêmê kêm zêde bixin kontrola xwe. Lê ne xêr, ew çi bikin jî wê nikaribin. Ciwanên Efrînê û gelê wê rê nadin dagirkeran. Gelê Efrînê yê ku ji ber dagirkeriya dewleta Tirk cih û warê xwe terk kir, yek deqe li cihê xwe nesekiniye û hêviya xwe ya vegerê winda nekiriye û nake jî. Ew bi zarokên xwe bawerin ku wê warê zeytonan li ser serê dagirkeran bikin dojeh û xezebê li ser wan bibarînin.

Li efrînê dewleta Tirk û dagireriya wê heye, lê yên ku ewlehiya li wir xirakirin di serî de Rûsiya û Emerîka ne. Rûsiya destek da dagirkeriyê û Emerîka ev dagirkerî erê kir. Hêzên li pişt van hêzên dagirker û saziyên qaşo mafê mirovan û NY jî wê nikaribin rûyê xwe yê reş ji rewşa Efrîn veşêrin. Lê ew ne libendê bûn ku wê şervan û gerîlayên çiyayê kurmêc ewqasî li ber xwe bidin û ya din jî ew bû ku hesab dikirin ger ku dagirkirin ew ê her tişt biqede. hesabên wan dîsa şaş bûn. Di bin her dareke zeytonê de şervanek û her zeytonek bûye guleyek li ser sîngê dagirkeran.

Soza hatibû dayîn ew bû ku ew ê nehêlin yek deqe jî be dagirker li warê zeytonan rihet tevbigerin û çalakî tên lidarxistin.

Çalakiyên ku tên lidarxitin jî her kes şoq hîştiye û teqînên herî dawî li nava Efrînê di navenda çeteyan de pêk hat serê dagirkeran tevlîhev kir.

Ê rastî jî wiha ye. ti ewlehiya cihekî xirab bikî ma gelo tuyê karibî di ewlehiyê de li wir bimînî ger ti hêzeke dagirkerî bî.

Yên ewlehiyê xirab bikin wê hesabê wê jî çiqas dereng be bidin. Efrîn niha herêmeke leşkeriye û çiqas kesên ku di pîlana guhetina demografîk de hatine herêmê kes nikare bibêje ku sivîlin û ew wekî sivîl nayê hesiban din. Ji ber ku bê rizabûna xwediyên vê axê hatine bicihkirin.

Ji ber ewlehiya li efrînê xira kirin jî Çi dibin û kî dibin ew ne xelaskerin, berovajî wê dagirkerin. . ji bo wan ewlehî ji ber ku hebûna wan û berjiwendiya desthilata wan xeteriye êriş dikin.